Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 199
3'ê Şibata 2013'an
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

**Agirî ber bi hejmara 200'ê ve diçe**

Duheftînameya Agirî hejmara wê ya 199'ê jî bidawî hat, û hêdî hêdî em nêzî hejmara 200'ê dibin. Lewra em xwendevanên Agirî agehdar dikin ku Agirî ji hejmara 200'ê pêde dibe xwediyê malperekê bi navê Agirimedia.org, û wê bi nûçeyên nû û rengareng, û bi zanyariyên nûtir wê di xizmeta xwendevanên xwe de be. Lewra em hêvî dikin xwendevanên me bona baştir û dewlemendtirkirina Agirî û malpera Agirî pêşniyar û têbîniyên xwe ji me re bişînin. Bê guman ew pêşniyar wê ji me re alîkarek baş bin.

**Desteya weşana Agirî**

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

R:5
**Dersa Komara Kurdistanê**

R:7
**Edalet ji bo sê jinên milîtanên ên Kurd**

R:8
**Bazirganîkirina gurçikanli Îranê de germ e**

R:11
**xwendegeha demokrat a kurdistana Îranê!**

Birêz Mistefa Hicrî:

# Îradeya takê Kurd ji komarê ve çavkanî digre, û dibe bingeh bo azadiyê



Bi boneya roja 2'ê Rêbendanê 67'emîn salvegera avakirina Komara Kurdistanê li herêma Kurdistanê, li derveyî welat û herweha li navxweye welat jî bi bilavkirina tiraktan û wêneyên pêwendîdar bi vê roja dîrokî rêz û hurmet ji vê roja dîrokî hate girtin.

Her di vê derheqê de evsal rêûresma 2'ê Rêbendanê li hola Pêşewa li bajarê Hewlêrê jî birêve çû ku di vê rêûresmê de gellek kesayetî û hizb û rêkxirawên Kurdistanî hatibû bangkirin, ku birêz sekreterê giştî ê PDKÎ jî têde beşdarî kir û herweha axavtinek giring jî li ser Komara kurdistanê pêşkêşî beşdarbûyiyan kir.

Bi sedema giringiya gotara navbirî me deqê vê gotarê li rûpelên sê û çar de bilav kirin. Hêjayî basê ye ku rêûresmên ev sal li nawenda 1, û nawenda 3'ê ya Kurdistanê, û her weha li Qeladizê û li Kelarê û gellek cihên din de birêve çûn, lê bi sedema kêmiya cih me nekarî em nûçeya tewaw ya wan rêûresman biweşînin.

## Rêûresma 2'ê Rêbendanê bi coşek mezin ve li binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ hate pîrozkirin



Ev rêûresma han roja yekşemiyê, 2'ê Rêbendana sala 1391'an a Rojî, bi xwendina sirûda netewî a Ey Reqîb û ragirtina deqeyekê bêdengî bona rêzgirtina ji canê paqij ê şehîdên Kurdistanê dest pêkir.Paşan birêz Mîro Elyar endamê Deftera Siyasî a PDKÎ, gotarek bi vê boneyê ve pêşkêş kir. Birêz Eliyar di gotinên xwe de ragehand:

"Du fakterên alîkar di damezirandina Komara Kurdistanê de, (serbarê îradeya gelê Kurd li dor damezirandina deselata Kurdî) bêhêziya deshilata nawendî û hebûna hêzên hevpeyman di herêmê de bûn.

Dijminên gelê kurd hemû hewlên xwe li pêxema berevajî nîşandana rastiyên deshelata Kurdî xistin kar, da ku bi vî awayî bi xeyala xwe xebata gelê me lawaz û bêhêz bikin.
Hewce ye ku em pêşketina hizra netewî û diyarîkirina mafê qederê a netewa xwe, herdem weke armanca gelê Kurd bibînin û bi têhn û goriyeke bê mînak ve bona bidestveanîna wê xebatê bikin. Di serdemê Komara Kurdistanê de, deshelat Kurdî digel Komara Azerbayicanê weke du netewan, hevalbendî û hevkarî bi hevre hebûn û em jî di pêşerojê de, dê mifahê ji vê emzûnê wergirin". Dawiya rê û resmê jî xwendina peyaman û herweha sitran û sirûdên şoreşvanî bû, ku coşek taybet dabû vê roja dîrokî.

## rejîma Îranê derheq teqînên li Erebistanê hate cezkirin



**dadwerekî Federal ê Amerîkayê regehand ku, malbatên 17 leşkerên Amerîkayî ku di sala 1996'an de, li teqîna "Xebar" a Erebistanê de canê xwe ji dest dan dikarin ji hisabên bankî ên Komara Îslamî pere hilgirin.**

Qazî "Kêvîn Kêstêl" biryar da banka "Tokyo - Mîtsûbîşî U F G" ku 260 hezar ji hisabên curbicur ên Komara Îslamî bidin malbatên goriyên teqîna Xebarê û banka navbirî jî rabû bi cîbicîkirina biryara han.

Di 25'ê Hezîrana sala 1996'an de, avahiya Xebar li Erebistanê hat teqandin û di encam de 19 kes ji pêrsonêlên leşkirî ên Amerîkayê hatin kuştin û 372 kes jî birîndar bûn. Karbidestên Amerîka û Erebistanê, Sipaya Quds ku beşa derveyî sînorên Sipaya Pasdarên Komara îslamî ye, weke bikerê teqînê dan nasandin.

## Îran di pileya 174'an de cih girt




**Rêxistina nûçegehanên bê sînor, rapora xwe a sala 2013'an, derheq azadiya çapemeniyê di cîhanê de ragehand, ku li gor wê Îran di nav 179 welatan de, di pileya 174'an de cih girtiye.**

Raporê eşkere kir ku, bi tenê çar welatên Sumalî, Sûriye, Turkemenistan, Kureya başûr û Êrître di warê binpêkirina azadiyên çapemeniyê de ji Îranê xirabtir in û herweha ragehand ku Îran yek ji wan 10 welatan e ku di dûmahiya rîzbendê de ye û tu rêzekê ji azadiya ragehandinê nagire.

# Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDK Îranê derheq bidawîhatina Sêyemîn Pilînoma Komîteya Nawendî



Bo agahdariya nûçegehaniyan sêyemîn pilînoma Komîta Nawendî a hilbijartî ji aliyê kongira 15'ê a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi beşdariya piraniya endamên eslî û cêgirên Komîta Nawendî roja yekşemiyê 27'ê Çileya Paşîn a 2013'an dest pêkir û piştî sê rojan karê berdewam roja sêşemiyê dawî bi karên xwe anî.

Pilînom bi ragehandina deqeyekê bêdengî bo rêzgirtin ji canê paqij ên şehîdan dest pêkir û destpêkê destûra karê pilînomê ku pêştir bi agahiya pişikdarên pilînomê gehiştibû kete ber bas û paş pesendkirinê sekreterê giştî ê PDK Îranê rêzdar Mistefa Hicrî şirove û berhevdanek siyasî li ser bûyerên navbera pilînoma duyem û sêyem a PDK Îranê, kir.

Ev berhevdad pitir li ser mesele û pêşhatên Cîhan, dever, Îran û Kurdistanê bi giştî bûn.

Hilbijartina dîsa ya Obama bi serkomariya Amrîka yê û pêywendiyên Cîhanî û rada hevhelwêstiya li gel welatên Ewropa yê bi hûrî îşere pê hat kirin û cihdanîna ev helvîsta û alugorên ku li ser rewta bûyerên Cîhanî û herêmî bi taybet herêma Rojhelata Navîn şîk kirin.

Tewereka din ya lêkdanê rewşa herêma Rojhelata Navîn û aloziyên wan herêmane weke dirêjiya xebata xelkê Sûriyê, aloziya Mîsrê û encama vê rewşê li ser pêşeroja herêmê bû.

Li pêywendî li gel Îranê jî birêz Mistafa Hicrî amaje bi kêşa etomiya komara Îslamî a Îranê li gel Çîhana dereve û nîgeraniya Cîhanî ji destpêka gehîştin a komara Îslamî bi çeka komkojî û bê encambûna rûnştina Ajansa Navnetewî a Têhna etomî û welatên 5+1 li gel rejîma Îranê û herweha bersîva erênî nedana vê rejîmê bo nehêlana nîgeraniyan kir.

Her di vê pêywendiyê de basek li ser sependina dorpêçan li ser komara îslamî a Îranê û bandor a dorpêçan li ser rejîm ji aliyekê û li ser jiyan û derbaskirina xelkê ji aliyek din de bû û pêşbîniya vê hatibû kirin ku domawan siyasetên rejîma Îranê dorpêçan qahîmtir û zêdetir dikin.

Beşek din ya lêkdaneweya nawbirî bas ji rewşa welatên deverê bi giştî bû û di vê pêywendiyê de pêngav hilgirtina dewleta Turkiyê û Rêzdar Ebdulla Ocelan serokê PKK ê bo got û bêjan bi armanca çareseriya pirsa Kurdên vî welatî ji rêya aştîxwazane ve, wek kareke girîng li pênaw qazac û berjewendiya Turkiyê û Kurdan zanîbû û hêvîxwaz bû ku ew pêvajo serbarî astengên ser rêya bigîje armanca xwe.

Aloziya Îraqê û bandor li ser hikumeta Herêma Kurdistanê beşeke din ji naweroka vê lêkolînewê bû, di vê pêywendiyê de rêzda sekreterê giştî li ser vê bawerê bû ku ev aloziyane bi wan zûyane bidawî nayê, bi taybet ku rejîma Îslamî a Îranê bi pilandanîn û kar û tekoşîna berdewam mijûlî kûrkirina kêşe û dûjminayetiya netewî û olî bi qazancê xwe ye, ji ber hindê dibe Kurdên Îraqê yekgirtî û hişyar pêngawan hilgirin bona ku encamên pêşbînî nekirî

Li dirêjahiya vê lêkdanê de rewşa Sûriyê û bi dirêjahiya vê şerê ku nîzîk bi du salan di navbera hikûmeta dîktatora vî welatî û xelkê nerazî pêk hatiye hat ber bas.

Di vê pêywendiyê de amaje hat kirin ku her çend hikûmeta Beşar Esed seba harîkariya bêderîxa hevpeymanan bi taybet rejîma Îslamî a Îranê kariye bo demeke din jî şer û kuştina xelkê bûdifa û jin û zarok Sûriyê bê kuştin û welatê zêdeti wêran biken, lê ev heyame direj nabît heriûa ciwala xelkê wezale hatiya Sûriyê ev hikûmetê birûxîne û Beşar Esed û darûdesta vî her vê çarenûsê tûş dibin ku li 2 an 3 salê derbas bûiy beşek ji dîktatoên din ya herêmê tûş bûn.

Sebaret bi rewşa xuşk û bira ê kurdên vê welatî rêzdar sekretrê giştî PDK Îranê nigeraniya we li rewşa deha hezar malbat ku li sir û seqema zivistanê naçar bûn mal û cihê akinciya xwe bihêlin û li helomera nalebar de derbas diken, di vê bawerê de bû Kurdên vî welatî paş nemana vê hikûmetê bûgoman destkevta siyasî dê baş bibe bêgoman rade û asta ev destevtane girêdaî bi rada yekbûna hêza siyasî û hevpeyvîna cida cida a Kurd di vê welatê de û bername û pilana hevbeş û yekbûyî a niha û paş roxana hikûmeta Beşar Esed.

Mesela Îranê û axirîn bûyer û alogorên vê welatî beşek girîng a rapor û likdanê bû.

Di vê pişkê de tevî amajekirin bi kûrtirbûna aborî û siyaseta Îranê gihîştin vê encamê ku rejîm bi domandina siyasta çevt ya xwe li navxwe û dereve nikare kêşên xwe kêm bike, û ew yek nîşananeya vê rastiyê ye ku rewşa rejîmê ji hemî aliyekê ve xirap e, bi taybet rewşa jiyan û derbaskirina xelkê şipirzetir dibe ku encama wê dibe bêzariya zêdetir a xelkê Îranê li rejîmê û bê hêviya hêz û aliyên navneteweyî bi taybet li Rojava û Rojhelata Navîn li warê guhertina reftar û siyaseta rejîmê, lewra rejîm roj bi roj zêdetir li hêza vêzarbûyî ya xelkê û siyaseta navneteweyî ditirse, lê ronê û li tirsa serhildana xelkê tundûtîjî, serkut û heta hejmara bidarwekirin zêdetir diket, aliyê din ya wan tundûtîjiyan vedigere ser amadakariya şanoyek din bi navê hilbijartina serkomarî a dewra 11'him ku qirare rejîm li meha Gulanê evsal dê birêve bibe.

karbidestên hikumetê jiberku bixwe baş dizanin ku ev şanogeriye weke şanogeriya sala 2009'an renge nerazîbûna û berxwedana xelkê lê bikeve, her ji a niha de dixwazin xelkê çavtirs biken bo evê ku dîsa serhildanên bi vî awayî nekin. Her di vê pêywendiyê de birêveberiya nizamî û leşkerî, keseyetîyên olî kirêgirtiyên rejîmê û Xamineyî bi eşkere xmijûlî darêtina pîlanan in. Di vê pêywendiyê de ewlehîkirina pitir ya Kurdistana Îranê û givaşa pitir bo ser rojnamevanan û çalakên siyasî û netewên din yê Îranê bi taybet Ereban, ku li çend mehên derbasbûyî de em şahid bûn encama wan siyasetan in.

Li beşûa din a rapora sekreterê PDK Îranê der ronahî hatibû xistin li ser kar, û tekoşîna PDK Îranê di navbera pilînoma pêşîn heya pilînoma sêyem, tekoşîna pêywendiyên PDK Îranê di vê demê de bi taybet girîngiya îmzakirina peymana parastina mefê jinan û zarokan li dema şer li Jinêvkalê û beşdariya nûnerê PDK Îranê li kombûna Duhe a ku nawenda gotûbêjên Elcezîrê sebaret bi mesela Kurd pêk hatibû, herweha dirêjedana siyaseta diyalog û lêk nêzîkbûn li gel hevalên pêşîn bi taybet serdana heyeta bilindpaye a PDK Îranê bi serperestiya sekreterê giştî yê PDK Îranê û her paş wê, serdana heyeta bilinpaye a wan hevalane li Deftera Siyasî a PDK Îranê, bo beşdaran hate rohn kirin, û cereka din pêdagirî li ser dirêjîdana siyaseta lêk nîzîkbûn û hevkarî kirin li gel partên Opozîsyon ên Kurd hate kirin.

Beşa dawiya karê pilînomê danîbûn bo basa encama karê wan heyetên ku li kombûna pêştir a Komîteya Nawendî li rastaya cîbicîkirina erk û gohertinên ku li kongera 15'ê de biriyar dabûn bo amadekirina ayînnamên nû, an jî pêdeçûn û bernama kar û ayînnaman, û me'mûriyetên ku bi wan hatibûn sipardin. Komîta Nawendî paş basa hûr û pêdeçûna bi ser karê amadekarina heyetan û karê tekoşîna sê mehên derbas bûyî, têbînî û rasipardên xwe bo bernama karî û dahatû heta kombûna dahatû destnîşan kir.

Dawiya karê pilînomê hatibû danîn bo çend têbîniyan li gor hemî lêkdanewe û bîrûboçûnan û herweha bo hişyarkirina pitir û pêşveçûna pitira ya karûbaran ji aliyê sekreterê gişî yê PDK Îranê, û paş bas û lêkdanewe li ser her yek ji wan meselane, ew bas bi pesenda pilînomê gehîştin. Sêyemîn pilînom a komîta nawendî a hilbijartiya kongira 15'ê a PDK Îranê paş encama hemû ew babetane ku li destûra pilînomê de hatibûn, demijmêr 11:30'ê şevê ya sêşemiyê dawî bi karên xwe anîn.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**

**Deftera Siyasî**
**30'ê Çileya Paşîn a 2013'an**

## Sergotar

# Îran kê dixapîne

**Şehab Xalidî**

Beşar Esed bi hêceta hebûna hijmarek zêde ji girûpên tundrew ên Îslamî wek Elqaîdeyê di nav refên opozisyonê de, bê rehmane xelkê welatê xwe tepeser dike. Rojavayî jî ku bi gotina xwe dijî terorê di herêmê de ne, carê ne li berjewendiya wan de ye ku bi awayek ektîv bikevne nav vê kêşeyê de.

Îxwanelmoslimîn ew hêza Îslamî ya ku di serdemê Hafiz Esed bi awayên herî tund dihate tepeserkirin, niha di nav hevalbendiya dijberên Beşar Esed de çend kursî hene û li gorî çavkaniyan ji aliyê hinek welatên herêmê ve piştevaniya madî û leşkerî ji wan tê kirin û weha dixuye ku wek welatê Mîsrê di pêşeroja Sûriyê de roleke bi bandor di qada hevkêşeyên siyasî ên Sûriyê de hebe.

Rejîmeke wek Îranê jî, niha propagendeyê bi dijî wan hêz û girûpên tundrew dike û welatên herêmê ji egera bidestvegirtina deshilatê ji aliyê wan hêzan ve ditirsîne.
Di wir de pirsyar ew e ku gelo hûn bêjin her deshilatek di Sûriyê de bête ser kar, ji rejîma Îranê bi tehlûketi be û bikare wek rejîma Îranê tenahiya herêmê têk bide?

Di rastî de ku piraniya welatên herêmê rejîma Îranê wek rejîma herî metirsîdar û bi tehlûke bo ser tenahiya welatê xwe dihesibînin û heya niha jî gellek caran bi eşkere karbidestên payebilind ên wan welatan de, bas ji destêwerdana rejîma Îranê di nav karûbarên welatê xwe de kirine û ew rejîm wek tehlûkeyek micid bo ser tenahiya welatê xwe hesibandine.

Lewra ew hewlên Îranê jî ji xwehilkutanekê zêdetir nînin, û weha nayê dîtin ku bi vê siyasetê jî rejîma Îranê bikare pêşiya hiloşîna deshilata Beşar Esed bigre û piştî hiloşîna Beşar Esed jî weha nayê xuyakirin ku deshilat bikeve dest girûpekê ku bi pişrtgiriya rejîma Îranê ji Beşar Esed bêrehmanetir xelkê xwe bikuje.

# Deqê axavtina birêz Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ li rê û resma 2'ê Rêbendanê li hola Pêşewa li Hewlêrê



**Amadebûyiyên birêz**

**Xûşk û birayên hêja**

**H**erwek hemû aliyek dizanin 67 salî berî niha li rojeke wek îro de li 2'ê Rêbendana sala 1324'an a Rojî gelê Kurd li9 Kurdistana Îranê de bi mifahwergirtina ji derfetek ku rewşa herêmî û navneteweyî pêk anîbû, li nav bajarê Mehabadê Komara Kurdistanê bi serokatriya Pêşewayê hertim zindî Qazî Mihemed ragehand, ewa di demekê de bû ku li 25'ê Gelawêja hemen vê salê de wate çenbd mehan berî ragehandina Komarê Partiya Demokrat bi serokatiya Pêşewa pêk hatibû.

Bê guman pêkhatina partiya demokrat bixwe rolek taybet li damezrandina komarê de hebû. komara Kurdistanê ji salekê kêmtir dom kir, lê di vî heyamê kurt de siyaset û bernameyên pêşkewtinxazane ên Komarê bûne cihê hêvê ji bo Kurdan li tewaya beşên Kurdistanê de, û di rastî de hemû aliye amadeyê beşdariya li komarê û xizmetkirina bi komarê bûn.

Beşdariya barzaniyan bi serokatiya nemir mele Mistefa ku fermandê hêzên komarê bû, û herweha serdana hijmarek jiu kesayetiyên Kurd li kurdistana Turkiyê bo Komarê, vê rastiyê diselimînin, lewra em dibînin ku piştî hiloşîna komarê û bidarvekirina Pêşewa Qazîmihemed û rêberên din ên komarê, li nwan 67 salên borî de li her cih û demekê de derfet hatibe pêş, gelê Kurd rêûresm bo bîranîna vê yadê pêk aniye, û tepeserî û zextên dîktatoran ew yad û nostalêjiya bihêz kiriye.

Bandorkirina komarê ne tenê li ser her takekî kurd, belkû li ser bîhaniyan jî ku şarezayê dîroka komarê û bûyerên wê demê bûne berçav bûye, û mezarê pêşewa jî bûye ziyaretgeha evîndarên komar û pêşewa ji dûr û nêzîk ve, û li vê pêwendiyê de qala du faktan dike.

Rozvêlt derbarê bi bandorbûna komarê dinivîse: "peydabûn û guherîna komara biçûk ya Mehabadê û dîroka kurt û bi bahoz ya wê, û jinavçûna ji nişkêve ya wê, yek ji bûyerên herî ronahî ên dîroka nû ya rojhilata navîn e".

Herweha Vîlyam Doglas dibêje ku: "tu heq bêjî, gora Qazî Mihemed ziyaretgehek e ku hemû hefteyan bi sedan Kurd serdana wir dikin". Ew herweha dibêje: "ciwanekî Kurd di gel hevjîna xwe di riya xwe de diçûn ku dar û barên wir, li wan dikirne sîber.

Ew siwarî guhdirêjekê bibû û jina wî jî li gel wî peya diçû, me silav da yektir û min jê pirs kir ku tu xelkî kûderê yî, wî jî got ku ew xelkê cihekî dûr e, xelkê bakûra rojhilatê Îranê nêzîk bajarê Xoyê. Min jê pirs kir ku hûn li wir çi dikin? Wî jî xwe wek Kurd da nasîn, û got ku "em diçne ziyareta mezarê Qazî Mihemed". Daglas di dirêjiyê de dinivîse: "Li dengê wî de kerb û kîn û amadeyî bona berberekaniyê dixuya. Herweha ji çavên wî û ji şûrê ber kêleka wî re xuya bû ku herkesek riya wî bigre, wê ew di gel wî şer bike".

Beşdarên birêz bûyerên dîrokî û çarenûssaz li bîreweriya takên her neteweyekî de dibne çavkanî û wizeya şûnasbexş bo jiyana serbixweyiya wê neteweyê, û ji aliyek din ve durustbûna hesta şanazî û serberzî li nav takekesan bi sedema peywestbûna wan bi vê neteweya taybet ve.

2'ê Rêbendanê û damezrandina komara Kurdistanê bûye, ew çavkaniya nasname bexş bo mirovên Kurd ( ne tenê li rojhilat belkû li beşên din yên kurdistanê de jî). 2'ê Rêbendanê tenê bûyerekî asayî nebû, ya ku vê bûyerê ji ên din cuda dike û giringiya taybet didê, xwe li komek bandordanînan li avakirina vê komarê û li hizra hevbeş ya takên Kurd de dibîne, ku heya îro jî hebûn û hizûra xwe bi şêwaz û formên curbicur li wateya kiryarên tak û partî û aliyên Kurdî de nîşan dide.

Heta heke bi awayek zanistî yan teorîk û dûr ji hest û soza Kurdane jî, em havrûyekê li 2'ê Rêbendanê bidin, dîsan jî ew giringiya ji me re eyan dibe bo mînak dema ku em havrûyekê didne wateyên netewebûna "neteweya Feranse" bidin, komar yan "Cimhorî yan Cimhoriyet" dibe "sitûna yekgirtin û bîreweriyên modern û hevbeş ên wan", herweha rolê paşayetî li Birîtanya û şanaziyên wî bo "neteweya Birîtanî".komara Kurdistanê piştî çend salên dûr û dirêj li hest bi bindestî û pile duyemîn bûnê, li cem takê Kurd dibe hêvinek bona dubare zindîbûna yek ji bingehên avakirina kesayetiya tak û neteweya Kurd bi çêbûna qewareyeke birêvebirin û deshilatdariya modern û li çarçoveya siyaset bi wateya wê ya modern ku li komara Kurdistanê de xwe nîşan dide.

Ji aliyek din ve Kurd bi taybetî di vê beşa Kurdistanê de bo yekem car li serdemê modern û hevçerx de, naweroka hewl û dawakariyên wan siyasî ne, ne aborî û kulturî û ji hemiyan giringtir ayînî, lewra nabe beşek ji rikeberiyên ayînî û mesebî, belkû netewe û deshilata netewe ji riya emrazên modern ve ku hikumet û deshilatdarî ye, li komar de form digre.xalek din ew e ku bi avakirina komara Kurdistanê, ew koma xeyalên ku berî komarê li hemû beşên Kurdistanê de fîdakarî jêre hatiye kirin, ji riya komak demûdezgeh û damezraweyan ve formek waqiî werdigre.

Yek ji berhemên herî giring ên komara Kurdistanê ew e ku bûye sedema vê ku heya niha jî mirovê Kurd vê rastiyê bizane ku tenê ji riya bidestvegirtina çarenûsa xwe û pêkanîna qewareyeke siyasî û hukimraniyeke modern ve dikare mafên xwe biparêze. Lewra komar bûye çavkaniyek watayî bona şûnaspêdan bi kirdara siyasî a Kurd bona çêbûna deshilatdarî û hukimraniya xwe û dûrketina ji paşgikbûn û hemwelatiyê pile du hesibandin.

Bi vî awayî îradeya takê Kurd ji riya damezraweya netewî (komar) dibe bingeh bo azadiyê û ew azadiya jî dibe serçawe bo mafên medenî û siyasî ên mirovê Kurd. li wir de azadî ûp nasyonalîz bihevre tê girêdan û dibe beşek ji hoviyet yan şûnasa mirovê Kurd. Xalek din ya giring ew e ku bijaredeyên Kurd hest bi vê yekê dikin kuy divêt li tewaya war û astan de ber bi modernbûnê ve pêngavan hilgire.

Dom: R:4



Beşdarên rê û resma 2'ê Rêbendan, Hewlêr başûrê Kurdistan, 2013

www.arsivakurd.org

**Doma Axavtina Rêzdar Mistefa Hicrî ya R:3**

Lewra em dibînin ku komar ji riya berhemên modernîte û eqlaniyet ku hizb ji aliyekê û birêvebirin û borokirasî ji aliyek din ve hewla destpêkirin bi piroseya modernîzasyon ( bi berçavgirtina civaka kurdewarî ya vê serdemê û li gorî şiyan û îmkanat ) dide, li warên siyasî de hewla çêkirina îdare û borokirasî û encomena wezîran û birêvebirina karê hizbî, û rekxiraweyî û ... dide. Eva ku li vê komarê de serkomar kesayetiyê yekem ê PDKÎ ye, ji vê rastiyê ve çavkanî digre.

Di warê civakî de komar dibe hokar bo pêkhatina derfetekê ( ku herçend destpêkî jî be) bo dubare avakirina civatgeha nû ya Kurdistanê bi guherîna pêkhatina wê ya eîşretî û dariştina vê li ser bingeha hemwelatîbûnê ku yek ji giringtirîn berhemên komarê ye, ku kêmtir giringî pê hatiye dan.

Di warê kulturî ve komar bi perwerdeya nû û serdemiyane derfeta modernîzasyona çandî bo tewata tex û qatên civakê pêk anî. Em vê yekê li çapkirina pirtûkên Kurdî û rakêşana zarokan bi xwendinê, hewildan bo nehêştina nexwendewarî, û beşdarîkirina jinan biu awayek ektîv li civakê de bi rohnî dibînin.

Bi fermînasîna zimanê Kurdî yekek din ji berhemên giring ên Komarê ye ku dibe watedarbûna vê pirojeya netewî û bingeha sereke ya gotara nasyonalîzma Kurd li vê parçeyê de ku li gorî tewaya teorî û dîtingehên zanistî niha pêde li jêr bandordanîna vê wateyê, reftara tak yan mijaran wateya xwe peyda dike û şûnasek Kurdî werdigrin ku ew yek li aweroka xwe de pêngavek micid e bo avakirina netewe bi wateya wê ya modern.

Xalek din ya komara Kurdistanê durutbûna vê şûnasa modern ya kurdî ye (kurdistanî) ku bi mifahwergirtina ji derfeta pêkhatî sînorê (yê din) diyarî kir û xwe jî pê pênase kir, wate ( ew bixwe) û ( yê din) û pênaseyek li ser bingeha bihevrejiyan bi taybet li gel neteweya Turkê Azerbaycanî pêk hat.

## Em xortên PDKÎ şanaziyê dikin ku piştî 67 salan ku bi ser rûxana komarê û bidarvekirina Pêşewa re derbas dibe, herwa alahilgirê xebat bo bidestveanîna armancên Komara Kurdistanê ne

Bijardeyên siyasî û netewî li vê serdem û zirûfê de bi xwendina rewşa navdewletî û dabeşbûna hêz li pêkhateya sîsetma navdewletî de mifah wergirtin û ew komar ava kirin. Niha jî bio formek din pêkhateya sîstema navdewletî yan aliyê kêm rojhilata navîn guheriye û formek sabît wernegirtiye, û ew yek jî derfet e bo me Kurdan û bo partî û rewşenbîran û ... hwd, ji vê pêla ku rojhilata navîn girtiye, û ji aliyek din li guherînkariyên serdemê bicîhanîbûn û emrazên modern ên teknolojî û reagehandin û pêwendî û bi giştî hêz nerm mifahê werbigrin.

Ew jî ezmûnek din ya dersên Komarê bû ji me kurdan, û ji me partî û tevgera rizgarîxwaziya kurd re. Lê derseke hiloşîna komarê ew e ku bê pêkhatina rejîmeke demokratîk li Îranê de ku rêz ji pirensîpên mafê mirov û bingehên demokrasiyê bigre, ew beş ji kurdistanê nikare li çarçoveya Îranê de bigîje mafên xwe, lewra dirûşma (avakirina Îraneke demokratîk û federal) ew xwendin e ku PDKÎ hilgirtiye û li pêxemê de xebatê dike, xebatek li du eniya de:

Ji aliyekê ve misogerkirina diyarîkirina mafê qederê bo Kurdan û neteweyên din bi alîkariya hemû neteweyan.

Ji aliyek din ve hewildan bona beşdariya li avakirina Îraneke demokratîk û federal.

**Beşdarên hêja!**

Em xortên PDKÎ şanaziyê dikin ku piştî 67 salan ku bi ser rûxana komarê û bidarvekirina pêşewa û kesayetiyên din ên Komarê re bi pêşkêşkirina bi hezaran xortên egîd ku li refa wan de rêberên wek Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî tên xûya kirin, li serdemê rejîma paşayetî û herweha serdemê rejîma Îranê de, herwa alahilgirê xebat bo destvanîna deskewtên komara kurdistanê ne û hevra û nişîvên sext ên vê riyê bo bîstekê jî guman li dilê me de pêk neaniye.

Silavên germ û niştimanperwerî bi hemû wan şehîd û kêmendamên dûr ji welat be ku ew rê domandin û bi serînetevandina xwe xewn xeyala rejîmên tepeserkar pûç kirin.

Silav li tev girtiyên siyasî ên Kurd bi taybetî ew xortên qehreman û cesûr ên rêbaza komar ku niha bi tawana kurdbûn û emegdariya bi rêbaza pêşewa û partiya wî PDKÎ, li girtîgehan de hatine ragirtin.

Silav û sipasiya ducarî bo we beşdarên birêz ku we bi amadebûna xwe ew merasima bi coş xemiland û we bi dujminê neteweya xwe nşîan da ku heke li Mehabada paytextê xûnîn û serbilind ê Komarê de xelkê Mehabdê û bajarên din li ber zexta komara Îslamî rê bi wan nahê dan ku bi eşkere li qada Çarçira komara xwe ya sdawa bibîr bînin, li hewlêr paytexta beşek din ji Kurdistanê û li hola pêşewa û bi beşdariya kurdên hemû parçeyan ew yad bilind tê ragirtin û sînor û zordariya dîktatoran nikare çi tiştekî ji vê rastiyê biguhere ku kurd yek netewe ye û kurdistan jî yek xak e.

**Berz û pîroz be yad û bîra avakirina komara Kurdistanê**

**Her bilind be alaya komar li sertaserê xaka kurdistanê**

# Niqurçk



Selam Îsmaîlpûr

Zêdetir ji salekê bi ser eşkerebûna talana sê mîlyard dolarî ya banka Millî ya Îranê re derbas dibe û niha Ferşad Heyderî, kargêrê vê bankê ragehandiye ku:"Yên ku ew diziya eşkere kirin, komeke îxanetkar bûn ku jêve bûn bi vî awayî dikarin xizmeta welatê xwe bikin, lê wan îxanet kir".

Wateyek din ya vê axavtinê weha ye ku: yên ku ew diziya dîrokî kirin, xizmetek dîrokî bi welatê xwe kirin, lê îxanetkaran nehêlan ku vê xizmeta xwe bidomînin.

-Mistefa Pûr Mihemedî, serokê Saziya lêgerîna giştî a welat dibêje: " Ew giraniya ku li Îranê de heye, heke li Ewropayê be, xelk wê bajaran tevlîhev bikin û wê tevdanîkariyan bikin, lê xelkê me sebr û tabek baş hene".

Raste xelkê gellek sebir û tab heye, lê sebra we jî gellek zor e Hacîaxa!!! Xwedê dizane we jî baş xwe li ber vê hemî birsîtî û giraniyê ragirtiye. Li li her ciheke cîhanê deshilat ew hinde ji aliyê xelkê ve bête nifirkirin, û xelkê lê bêzar be, bawer kin, wê wusa deshilatê bi cî bihêlin û birevin ku kes toza wan jî nebîne, lê wellehî Hacîaxa ez û xwedê sebra we gellek zor e, her li xwe re nine ku gotine bêhna fireh, û hemda dewara.

-Piştî derbasbûna heşt salî bi ser serkomariya Ehmedînijad de, li gor gotina wan axayan! Komara Îslamiya Îranê meymûnek şande valahiya esman û li salvegera vegeryana Xomênî bo Îranê, ew jî vegeriya Îranê. Helbet vê bestezimanê hêşta serdana Beheşta Zehrayê nekiriye û îzin pê nehatiye dan ku ser devê dewletê bide û dewletê ragehîne, ba mirov çi bêje, renge dabe ber xatrê Mehmûd, her nebe serokê dewletê li bav û kalên xwe de digîje bapîrê vê rêwiyê esmanger!!!

-Pasdar Ehmed Wehîdî wezîrê parastina Îranê gotiye: "li ser şeqam û kolanên me çi şûnwareke gemaro û dorpêçên aborî nahê dîtin".

Hêjayî basê ye ku qetara xelkê birsî ku bona wergirtina birinc kolanên herderê dagirtibûn, li vê heftiyê de tewaya bajarên Îranê jî girte xwe. Ku wehabû divêt em bêjin: kekê hêja heke tu nabînî, kêşe di çavên te de ye, hekî ne şeqam û kolan her şeqam û kolanin û dorpêç her dorpêç û birîtî jî her birsîtî ye.

www.arsivakurdi.org

# Dersa Komara Kurdistranê



Bêhzad Xoşhalî

Serhildan û şoreşa Qazî Mihemed bi sedema naweroka cuda û taybetmendiya modern ya wê, tevgera herî girîng li dîroka siyasî ya neteweya Kurd de ye.

Taybetmendiya herî bingehîn ya şoreşa Qazî Mihemed ku bû sedema cihgirbûn û avakirina Komara Kurdistanê li dewrana 1946 -1947'an, esliyet û naweroka demokratîk ya wê di cihgirbûna kiryarekê ye ku heya niha jî dikare bibe berjeng û sembol û mînakek baş bo hikumetên Rojhilata Navîn.

**Kiryar:** Şoreşa Qazî Mihemed Hokar: Komeleya J-k, Qazî Mihemed, PDK Îran

**A- Cih:** Beşên sereke ên Kurdistanê li başûrê Azerbaycana Rojava (Mokiryan) û beşek ji bakûra parêzgeha Kurdistan ( Bane û Seqiz) ku li vê dewranê de hinek beş ji eyaletên Azerbaycan û Erdelan bûn.

**B- Dem:** 1944 - 1947

**Riya şoreşê:** Serhildana çekdarî û pêwendiyên dîplomatîk

**Armanc:** Avakirina Komara Kurdistan

Her wek ku hate gotin giringtirîn taybetmendiya Komara Kurdistanê bi rêbertiya wQazî Mihemed, aliyê mneteweyî demokratîk ya wê ye ku li warê pêkhate, pênase û damezrandin çarçoveyekî modern hebûye, û mirov dikare li ser binega pênase û pîverên modern ên demokrasiyê lêvekole.

Ji vê dîtingehê û li gorî çar teoriyên modern ên demokrasiyê wate demokrasiya bazar, demokrasiya neo komarîxwaz, demokrasiya bavserdest, û demokrasiyê Jakopinî, mirov dikare Komara Kurdistanê li ser bingeha pêkhateyeke demokrasiyê Jakopinê bizane û bihesibîne ku têde komek naskirî ji lihevhatinên nirx û buhayan û pileyeke bilind ji beşdariya siyasî (neteweyî demokratîk) mirov dikare bibîne. Li vê dîskorsa demokrasiyê de herweha mirov dikare giringiya hebûna şemkên neteweyî û netewe li qalibê têgeheke civakî ya îradî peyda bike, ku warê siyasî girtne xwe, û li têgehê de rizayeta giştî li dû xwe re hebûye.

Xalek din ya giring ku li Komara Kurdistanê de hebûye, netewebawerî ye, ku wek destewajeyeke modern pênasekerê komek ji mirovan e ku xwe wek hoviyetek cuda li qalibê yekîneyeke siyasî, cihake erdnîgar û çandeke cuda pênase dikin.

Taybetmendiya sêyemîn ya Komara Kkurdistanê mirov dikare li rolê Qazî Mihemed de bibîne. Qazî Mihemed herçend ku kesekî olî û xwediyê pêgeheke bihêz ya malbatî ye û gelek alî rolê "olî Karîzmayî" wek sedema bilinbûna navbirî pênase dikin, lê mirov nikare rolê bihêz bûna eqlî ya navbirê li xweagayî, destnîşankirina aliyek diyar, hevahengî, rêxistina têgihîştinan û bicihkirina wan li dîskorseke piraktîzekirî bi navê Komara Kurdistanê berçav negrin.

Ya herî giring ew e ku taybetmeniyên malbatî bi alîkariya eqlaniyet, rêberekî pêk tînin ku ew xelkê eşîreyî û navendgera li xalekê de kom dike, û bi carek din naskirina hoviyet û şûnasê û herweha ser ji nû berhemanîna hoviyetê, morala "em"dibexşe. Ew "EM" a ku li dawiyê de erkê serjinû ji dayîkbûna nirx û buhayan digre stûyê xwe, û wek îdeolojiya neteweyî şûnas û kesayetiya neteweyekê nîşan dide.

Taybetmendiya din ya Komara Kurdistanê pêkhatina rewşek hejî bo derbazbûna ji pêkhateyek kevneşop bo organîzasyoneke modern e.

Avabêna Komeleya J K, li jêr bandora Hizba Hîwa li kurdistanê Îraqê û pêkanîna wê, wek rêxistineke veşartî bi tewertiya Kurdbûnê, û li doma wê de guhetina wê bo PDK, li gorî bingehên partiyek modern, û cihdana daxwaziyên xelkê Kurdistanê li qalibeke hizbî taybetmendiyeke herî giring ya Komara Kurdistanê ye. Taybetmendiya din ya komara Kurdistanê anîne ber bas ya xwestekên modern li qonaxekê û lio cihekî de ye ku di rastî de ne Komarîbûnê qebûl dike, û ne jî demokrasiyê.

Anîne berbasa mijara Komarî li cem têgeha Demokrasiyê li welatekî de ku paşa wek xwedayekê li nav her aliyek hizra hikûmetî ya wê de cih giritiye, hevgirtinek mubarek bû ku reh û rîşeyên destpêka guhertina vê dîskorsê, û şikestina pêkhateya zeynî nebizanebûna xelkê cîbicî kir û hizra mirovê rojhilatî ber bi hizra mirovbaweriyê bir. Hewildan bona perwerdekirina modern li herêmên li jêr deshilata hikumetê, îcrayîkirina pêkhateya nîzama dozgeriyê...

Dom R:10

## Bandora hilbijartinên Îsraîlê li ser Rojhelata Navîn



W ji Îngilîzî: Moitesem Nûranî

Parlementa Îsraîlê (Kinêst) ji 120 kursiyan pêk tê. Hekî partiyek an jî çend partî bi hevalbendiyekê bikarin pitir ji nîvî a kursiyên parlementê bidest bînin, eva dikarin kabîneya xwe a nû ava bikin.

Lê di dîroka 64 salî a Îsraîlê de, wate ji sala 1948'an ve heya niha, tu partiyekê nekariye bi tenê kabîney hikumetê ava bike. Herweha ji sala 1990'î ve heya niha, gellek caran lihevhatina wan partiyan hatiye hiloşandin û parlementê nekariye çar salên xwe bi davî bîne û neçar maye ku, hilbijartinên xwe pêş bixîne.

Ev kare bûye urfeke siyasî û vê carê jî heyamê 10 heyvan hilbijartin zûtir ji midehê xwe ê diyarîkirî birêve çû. Piraniya lêkolerên siyasî li ser vê baweriyê ne ku eve zîrekiya Netanyaho bû bona bidestveanîna kursiyên zêdetir di hilbijartina vê carê a parlementê de.

Herçend di hilbijartinên sala 2009'an de, partiyên rastrew û mesebî piraniya kursiyên parlementa Îsraîlê bidest xistin û, Netanyaho jî ku serokê opozisyonê bû karî bi beşdarîkirina partiyên rastrew weke, Lîkûd û Îsraîl Mala Nû û partiyên mesebî weke Şas, Mala Yehûd, Yehûdiyeta Tewratî a yekgirtî û partiya çep a kar lihevhatinek mezin pêk bîne û kabîneya xwe ava bike.

Herçend di vê hevalbendiyê de li ser gellek xalên girîng weke ewlehiya netewî, piroseya aşîtiya Îsraîl û Felestînê, pirsa etomî a Îranê, cudahiya dîn ji dewletê di siyaset û demokrasiyê de, cudahiya bîrurayan hebû, lê bi wî halî ji lihevhatinek berçav di nav wan de hebû, bi taybet hemû bihevre li ser pirsa Îran û keysa etomiya vê hevbîr bûn.

Hilbijartinên vê carê a Îsraîlê di demekê de birêve diçin ku rewşa rojhilata navîn aloztir ji berê ye û, Îran jî serbarê dorpêçên abûrî di gel rewşek nebaş a navxweyî û giwaşên bê hisab ên civaka cîhanî berbirû ye û her li ser pirograma etomiya xwe berdewam e. herweha rewşa Sûriyê ku di bakûr de hevsînûrê Îsraîlê ye roj digel rojê zêdetir ber bi xirabiyê ve diçe û ji aliyek din ve kirîza Îsraîl û Felestînê her di cihê xwe de maye û hêj "eniya berxwedan"ê gefek micid e li ser Îsraîlê.

Di hilbijartina vê carê de serbarê vê ku partiya Lîkûd gellek ji dengên xwe jidest dan, lê hêj weke hêza herî sereke derket holê û piştî hilbijartinan jî, Netanyaho bi sedema bidestve anîna piraniya kursiyên parlementa Îsraîlê, serkvetina xwe û partiya xwe ragehand û pîrozbahî ji alîgirên xwe kir û bo cara sêhemîn li ser kursiya serokwezîrê Îsraîlê dimîne.

Li gor raporta Roytêrzê, partiya Nitanyahû 31 kursî ji 120 kursiyên "Konsêtê" bidestve aniye û hêj serdestê tewahiya partiyan e. Bi vî awayî bo gellek kesan eşkere bû ku Lîkûd serkevtiyê qada hilbihartinên Îsraîlê dibe.

Bi vî awayî Binyamîn Netanyaho serokwezîrê Îsraîlê ku di temenê 63 saliyê de ye digel gellek arîşeyên navxweyî û derekî berbirû ye û arîşeya herî girîng jî, pirsa Îran û çeka etomî ye...

Dom R:9

www.arsivakurd.org

Hejmar 199, 03'ê Şibata 2013

**Li jêr sîbera deshilata rejîma dijî mirovî a Îranê de, gellek xortên vî av û xakî tenê bi sedema vê ku daxwaza mafê xwe ê rewa yê mirovî û siyasê kirin, ketne ber kerb û kîna wan mirovkujên ku olê pîroz ê Îslamê ji xwe re kirin emraz da ku bigîjin armancên xwe ên qirêj, û bi awayên herî hovane hatin kuştin, yan jî bi salan di girtîgehê de man. Yek ji wan xortên ku kete ber vê kîna deshilatdarên Îranê û nêzîk bi du dehikan ji temenê xwe di girtîgehan de derbas kir, hevalê berxwedêr û şoreşgêr birêz Arif Qasimiyan xelkê gundê Hewtawaya ser bi Urmiyê li rojhilata Kurdistanê ye. Niha ku navbirî carek din jiyana serfirazane ya dûr ji jiyana li jêr siya deshilata cînayetkarên rejîma Îranê ji xwe re hilbijartiye û di Kurdistana Îraqê de dijî, me jî ji vê derfetê mifah wergirt û bi navbirî re hevpeyvînek pêk anî, bi vê hêviyê ku jiyan û xebata navbirî bibe mînak bo tewaya xortên Kurd ku dixwazin rojekê bigîjin rojên geş ên azadiya neteweya xwe.**



Hevpeyvîn: Bahoz

Arif Qasimiyan kurê Ebdulkerîm sala 1347'an li gundê Heftawa li herêma Mirgewera Urmiyê ji dayîk bûye. Ew pênc bira û çar xûşk bûne. Bavê wî jî bi karê cotkariyê jiyana xwe bihorandiye.

wî heya pola pêncê dibistanê ders xwandiye, lê şoreşa gelên Îranê bi ser de hatiye û wî jî nekariye dersa xwe bidomîne. Li Buhara sala 1363'an de diçe nav refên pêşmergeyên PDKÎ, lê li ber kêmtemeniyê nayê wergirtin, û piştî sê rojan vedigere mal. Navbirî hertim li hizra vê hindê de bûye ku rojekê çeka pêşmergetiyê hilgire û xizmeta gel û nîştimana xwe bike. Sala 1366'an çûye leşkeriyê, lê leşkeriya xwe bidawî neaniye û li sala 1367'an de bi çek ve hatiye ser rûbarê "serkem"ê li ser sînorê Turkiye û Îraqê û li wir tevlî refên PDK Îranê bûye. Birêz Arif Qasimiyan derheq tevlîbûna bi pêşmergeyên PDKÎ re, weha ji duheftînameya Agirî re axivî: "Ez deh rojan li hêza Klîeşîn mam, û piştre vegeriyame cem hêza Agirî, ku wê demê Seîd Gulê serlikê hêza Agirî bû. Lê her di vê rojê de Seîd Gulê ez şandim meimoriyetekî hizbî bo navxweye welat.

Min jî ew meimoriyet li du rojan de cîbicî kir û vegeriyame binkeyeke PDKÎ. Em li payîza 1367'ê vegeriyane herêma Bêşê li Kurdistana başûr, û li zivistana 1367'ê de ez bo dewreyekê siyasî - nîzamî çûme binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ li Qendîlê. Em du mehan li wir man.

Lê hêşta me dewre bidawî nekiribû ku bi sedema vê ku çavên min dêşiyan, PDKÎ ez şandim Silêmaniyê cem duktur. Li Silêmaniyê mixabin ez ji aliyê îstixbarata rejîma Îraqê ve hatim girtin, jiber ku min karta pênasê tunebû. Piştî çar rojan ez şandim Kerkûkê. Ez sê meh û heşt rojan li Kerkûkê li destê Beisiyan de bûm. Piştre ez şandim ordûgeha Romadiyê ku penaberên Îranî li wir bûn.

Li sala 1369'ê bi dizî ve min xwe gihande binkeyên PDKÎ li Bêşê, û min meseleya girtina xwe ji wan re bas kir.

Mixabin carek din dîsan ku min dixwast serdana mala xizmeke xwe bikim, dîsan ez hatim girtin û jiber ku vê carê min karta pênas ya penaberiyê hebû ez rast şandim Romadiyê, û heta sala serhildana Kurdên başûr wate sala 1991'ê ez li Romadiyê mam.

Dîsan ez çûme Bêşê, û min meseleya girtina xwe ji wan re bas kir û bo heyamê deh rojan li wir mam. min herweha gote wan ku ez dixwazim herme derveyî welat. Lewra sala 1992'ê ez çûme Turkiyê û salekê li Turkiyê mam. piştî salekê min xwast ku serdana mala xwe bikim, lewra ez çûme Îranê. Li wir jî ez ji aliyê Îtilaata Îranê ve bi sedema vê ku pêşmerge bûme hatim girtin".

Birêz Arif Qasimiyan li derbarê girtina xwe ji aliyê Îtilaata Îranê ve weha axavtina xwe domand: "Ez çar meh û 27 rojan li Îtilaatê de mam, piştre radestî dozgeriya leşkerî (dadseraya nizamî) hatim kirin. Heta çar salan jî ez ragirtim û hukmê min bi min ranegehandin. Lê piştî wan çar salan 19 sal zîndan dane min".

Li gorî gotina navbirî li hukmê wî de hatibû ku bi sedema alîkarînekirina bi me re, heya bidawîhatina wan 19 salan, nabe mafê efûkirin û îzinpêdan (morexesiyê) hebe.

Di rastî de ew hukm nîşaneya vê bû ku navbirî li jêr tu zextekî de amade nebûye ku teslîmî xwestekên wan be. Lewra min xwast ku zêdetir li ser mana navbirî li girtîgehê de, û şêweya reftara berpirsyarên girtîgehê pirsan lê bikim.

"Ez dame benda nizamiyan. Li vê bendê de min çend kes nas kirin ku ew jî pêştir pêşmerge bûn. Piştî zêdetir ji salekê em dane benda sê û çar ya qatilan. Ez çar salan li wir mam, piştre dîsan ez şandim benda nizamî. Heya sala 1378'ê ez li benda nizamî de bûm ku carek din dîsan ez dame benda qatilan.

Di vî heyamî de gellek caran ez şandim bendên takekesî, û herweha benda girtiyên li ser madeyên hişber.

Heya deh salan ez li wir de mam. piştî vê ez şandim benda siyasî ku hatûçûya min bo cihên din qedexe kiribûn, û li ser yek piştî 19 sal û sê mehan ez azad kirim".

## Di girtîgehê de gotne min ku emê du milyon tûmenî û herweha trombîl û malekê jî bidin te, û tu jî kesekî pêşmerge bo me teror bike. Min jî bi kenî we gote wan, welehî ezê herim, lê ezê vî diravî bi ser pêşmergeyan de parve bikim

Navbirî li derbarê şêweya reftara berpirsyarên girtîgehê got ku wan hertim dixwastin ku bi zorî xwestekên xwe bi ser girtiyan de bidin sepandin, û wan neçar bi teslîmbûnê li hember xwe de bikin, û herçend ku wî tu îfadeyek nekiribû jî, lê wan bi zorî 19 salan ew di girtîgehê de ragirtin. Li gorî gotina navbirî xweştirîn dema girtîgehê ew dem bû ku kesek ji malbata wan dihate serdana wan, û demên xatirxwastina wan jî nexweştirîn demên girtîgehê bû. Min jê xwast ku ew bîreweriyeke xwe ya girtîgehê ya xweş ji min re bas bike, wî jî bi kenî ve got ma li girtîgehê de bîreweriyên xweş hene?!.

Piştre gote min ku ez serbarê wan hemî zehmetiyan tu caran heta li dema hatina dayk û bavê xwe de jî ku ew digiriyan, ez nedigiriyam, lê dema ku min hukmê xwe bidawî kir û ji girtîgehê de derketim, ez giriyam, jiber ku hevalekî min yê semîmî bi navê Ezîz Sadiqî ku pêşmergê PDKÎ bû û li şer de hatibû girtin, carê hukmê wî bidawî nehatib. Ew kesekî cesûr û berxwedêr bû û tu carî wî li hember dujmin de serî neditevand.

Wî herweha wek bîrewerî bas li dema dadgehîkirina xwe jî kir û got:

"Meimûrê lêpirsînê gote min emê du milyon tûmenî û herweha trombîl û malekê jî bidin te, û tu jî kesekî pêşmerge bo me teror bike. Min jî bi kenî we gote wan, welehî ezê herim, lê ezê vî diravî bi ser pêşmergeyan de parve bikim. Herweha gote min gelo heke rojekê bi tenê ez bihatibam pêşberî te, te wê ez bikuştibam, min jî gotê ez berbirûyê te nebûme, lê renge min tu kuştibayî. Wî jî gote min ku min ew pirs ji gellek girtiyan kir, lê wan gotin me tu nedikuştî!".

Wî her weha bas ji bilavkirna tiryakê û madên din ên hişber li nav girtîgehê de jî kir û got: "Li wir de berpirsyarên girtîgehê bixwe ew made bilav dikirin, heta tu caran serdana benda deh nedikirin, bona ku bi rehetî wan madeyan bikar bînin. Herweha wan bixwe derziyên tezrîqkirina wan madeyan diavêtne nav bendên girtiyan de, û girtiyan jî bi kom ew bi kar dianîn".

Birêz Arif Qasimiyan ku şanaziyê bi vê berxwedana xwe li nav girtîgehê û serî netevandina li hember dujmin de dike, niha jî her bona vê ku xizmetê bi gel û welatê xwe û partiya xwe bike hatiye kurdistana başûr, û bûye endamê PDKÎ.

Ew her niha jî bi hêvî ye ku rojekê bi serbilindî û azadî vegere nav malbat, û xizm û kes û karên xwe de, û li jêr alaya Kurdistanê û li Kurdistanek azad de jiyane xwe biborîne. de berpirsyarên girtîgehê bixwe ew made bilav dikirin, heta tu caran serdana benda deh nedikirin, bona ku bi rehetî wan madeyan bikar bînin. Herweha wan bixwe derziyên tezrîqkirina wan madeyan diavêtne nav bendên girtiyan de, û girtiyan jî bi kom ew bi kar dianîn".

Birêz Arif Qasimiyan ku şanaziyê bi vê berxwedana xwe li nav girtîgehê û serî netevandina li hember dujmin de dike, niha jî her bona vê ku xizmetê bi gel û welatê xwe û partiya xwe bike hatiye kurdistana başûr, û bûye endamê PDKÎ. Ew her niha jî bi hêvî ye ku rojekê bi serbilindî û azadî vegere nav malbat, û xizm û kes û karên xwe de, û li jêr alaya Kurdistanê û li Kurdistanek azad de jiyane xwe biborîne.

www.arsivakurdi.org

# Edalet ji bo sê jinên milîtanên ên Kurd



Kendal Nezan

Civata kurd bi kuştina sê milîtanên kurd li Parîsê, di 9'ê Çiriya Paşîn de hejiya û serûbin bû. Yek ji wan Sakîne Cansiz, sîmayeke naskirî ya PKK'ê ye, ku di avakirina wê de li gel Ocalan beşdar bûbû, û di 1979'an de hate girtin û 12 salan di zindanên xirab ên Turkiyê de ma.

Bi sedema cesareta wê, heta bi milîtanên Turk ên çep û femînîst ên ku bi deh salan di zindanên Turkiyê yên wê demê de riziyan rêza wê digirtin. Dewleta Turkiyê 3500 gundên kurdan vala kirin û wêran kirin.

Gelo li hemberî rejimeke ew qas wehşî û heqaret lê kiribû, û her awayê îfadekirina nasnameya wê qedexe kiribû dikarî çi bikira? Keçeke ciwan ku di civateke demokratîk de dikaribû bibûya mamoste yan parêzer, bi vî awayî bû berxwedêr. Dewleta Turkiyê 3500 gundên kurdan vala kir û hilweşand, ji du milyonan zêdetir kurd ji şûn û warên wan dûr kir û bi hezaran ronakbîr dan kuştin.

Lê Enqerê dîsa jî weke modeleke demokratîk hate hesibandin ji ber ku ew endamê NATO'yê ye, lê kurdên ku li hemberî wêrankariya wan de ber xwe dan, heta li Fransayê jî weke terorîst hatin dîtin.

PKK'ya ku weke encama şideta dewletê û îdeolojiya marksîst-lenînist a salên 1960'î derket holê, ber bi miletperweriyê ve guherî û dawiyê dev ji armanca xwe ya Kurdistaneke serbixwe jî berda, qîma xwe bi daxwaza mafên çandî di çarçoveya Turkiyeyeke desantralize û demokratîk de anî.

Turkiye bixwe jî guherî: Ew êdî ne di bin tesîra leşkerên kokbir ên salên 1980-1990'î de ye. Piştî ku hemî teknîkên li dijî serhildanê ceribandin, hemî metodên asîmîlasyona bizorê li dijî Kurdan bikar anî, piştî 30 sal şerê ku bû sedema 45 000 kuştî -ku ji %90'ê wan kurd in- û aboriya Kurdistanê ya çandinî û pezdariyê ku ji budceya Turkiyê re bi 400 milyar dolarî (297 milyar euro) bû mal têk da, têgihîşt ku çareseriya leşkerî ya pirsa ji 18 heta 20 milyon Kurdên Turkiyê tuneye.

Di encamê de xwe mecbûr dît ku bi serokê PKK'ê re hevdîtinan pêk bîne bona ku dawiyê li şerî bîne û pirsa kurdî ku nêzîkî sed salî ye jiyana siyasî û têkiliyên navneteweyî yên Turkiyeyê xistiye bin îpotekê, di atmosfereke hêmin de minaqeşe bike û jê re heleke adîlane bibîne. Ev pêvajoya nazik û pêşeroja wê nediyar, dîsa jî hêviyê dide gelê Turk û kurd ên ku ji şerî bêzar bûne.

**Tesfiyekirina doza kurdî ji aliyê serokê wan ê zîndanîkirî ve**

Her wiha ev pêvajo di dilê nijadperestên Turk, û hin derdorên leşkerî de dijminantiyeke xedar peyda dike. Heta di nava PKKê de jî, deng bilind dibin ku "tesfiyekirina doza kurdî" ji alî serokê wan ê zindankirî ve rexne bikin. Îran û Sûriye jî zendûbendan badidin destê xwe bixin nav vê pêvajoya aştiyê ku, heke seriyek jê derkeve û giraniya herêmî ya rikeber û dijminê wan ê Turk bihêztir bike.

Berî niha bi deh salan, basa çareseriyeke aştiyane ya ji aliyê serokê mêrxas ê Turk, Turgut Ozal (1927-1993) ve dest pê kir, lê bi awayekî trajîk dawî lê hat. Li gor gelek şadetiyan, ya malbata Turgut Ozal jî di nav de, teyrebazên artêşê, serokê dewletê jehirdayî kirine.

Kêmkirina rolê siyasî yê artêşê û mêrxasiya derxistina hemberî mahkemê ya generalên têkiliya wan bi şebeka Ergenekonê, hemtaya Turk a şebekeya ixbarê ya li dijî komunîstan Gladio re hebû, bû nesîbê Hikûmeta Erdogan. Wî her wiha têkiliyên xwe bi Kurdistana Îraqê re, ku jêrzemîna wê tejî petrol û gaz e, xweş kirin.

Îcar ev pevgirêdana nû bû ku, tevî wê dizanibû her heman hikûmeta Turkiyê ya îro ye ku 8000 milîtanên kurd, ku hin ji wan parlamenter û şaredar, her wiha 46 rojnamevan û nezîkî 40'î jî parêzer in, şandiye zindanê, cesaret da Sakîne Cansiz ku di rêvekirina Enqerê ya ber bi serokê PKKê de hêviyê bibîne. Ne ew, ne jî hevala wê Rojbîn (Fîdan Dogan) dê ne vebûna deriyê xêrê yê vê pêvajoyê ne jî azadiya Kurdistana xwe ya xweşdivî ku ji bo wê bihayê herî giran dan, nebînin.

Îhtimala ku lêpirsîn dûr û dirêj û dijwar be, bi taybetî jî heke mirov bixwaze xwe bighîne kesên li paş vê cinayetê yên ku emir dane, pir e. Heta niha, wê derfeta girtina kesekî da. Ev kes mirovekî bi eslê xwe Turk û ji malbateke nêzîkî tevgera rastê tûj ê nijadperest e. Ew li Turkiyê tevlî kuştina bi sedan kuştinên siyasî bûye, êrîşa li hemberî papa Jean Pûlê duyemîn û êrîşên li dijî Ermeniyan li Fransayê jî wê kirine. Tawanbar, Omer Guneyê ku Firansî û Almanî dizane, bi saya xizmeta xwe ya wergerê, serê salekê ye bihêsanî karibû bikeve nava hin komeleyên nêzîkî PKK'ê, ku endamên wan karkirên koçber ên sade ne. Bi vî awayî xwe gîhandiye heta radeya ku bi Sakîne Cansiz re here Birêvebiriya polîs ku wexta qerta wê ya rûniştinê dirêj bike.

Îdareya jiyana vî "bêkar"ê ku, li gorî şadetiya hevalê wî yê malê, karibûye bibe xwediyê nêzîkî çel bedlî û gelek telefonên destî, gelek rêwîtiyên wî yên Turkiye û Almanyayê, tu şik û gumanê li ser nahêlin ku ew kesekî biserê xwe be û li ser hisabê xwe tevbigere an jî ji PKK'ê veqetiya be, û ji bo hisabekî navxwe tiştekî wiha bike.

**Ev şebekeyên tarî ku Turk weke "Dewleta kûr" binav dikin**

Lêpirsîn divê rolê rastî yê vî tawanbarî yê di van kuştinan de eşkere bike, bikir an bikirên van cinayetên wehşî, tevger û fermanderên wan derxe holê. Awayê kirinê diyar dike ku kesên li paş vî karî ne, dikarin teyrebazên îstixbarata Turkiyê yên ku dixwazin pêvajoya diyalogê ya ku ji alî hikûmetê ve hatiye destpêkirin sabote bikin bin.

Ev şebekeyên tarî ku Turk ji wan re dibêjin "Dewleta kûr" gelek caran zanibûne weke milîtanên rastê tûj, milîtanên çepê tûj jî bikar bînin ku êrîşan pêk bînin û hikûmetên siwîl bêîstiqrar bikin.

Di rewşeke weha de, tercîha Parîsê dê ne hêsan be. Jixwe Fransa, ji ber helwesta xwe ya pirsa naskirina jenosîda Ermeniyan û hezkirina xwedêgiravî ji kurdan, di nav van derûdorên nijadperest de weke "antîTurk" tê dîtin.

Weke me di nimûneya Mihemed Elî Agca, kirdarê êrîşa li dijî papa ya di 1981'ê de jî dît, ev tûndrew ceza dikşînin û yên wan tûj dikin jî bi hosteyî şopa xwe winda dikin. Em hêvî dikin ku edaleta Firansî ji bo herkesî bibe nimûne.

**Çavkanî: "Le Monde"**

**Wergera ji Firansî: Yakub Karademir**

## Rojev

## Berhema Şoreşê!

Selîm Zencîrî

Wa em nizîk dibin ji 34'mîn salvegera serketina şoreşa gelên Îranê li dijî rejîma paşatiyê. Şoreşek ku awisê azadî, wekhevî û dadperweriyê bû û dihat payîn ku serketina şoreşê wê bibe xala guhertina Îranê û xelik li hember wan nirx û bedelên dayî de, wê bigihîjin hêvî û xewnên xwe! Bêhay ji wê ku bîjî û zirmirovek ji zikê şoreşê de wê were dinê û siwarê îhsasatên mesebî ên wan bibe û dilinganiya xwe bi ser şoreşê de dade.

Belê -Îmam- hat, Îmamek himbana kînê û têhniyê xwînê. Tevnek raçand ku piştî sê dehsalan hêj berdewam e. Wî bi hêsanî toz kire nav çavê xelkê û nîzamek totalîter a mesebî bi navê Komara Îslamî bi ser wan de sepand. Bi vê xewn û ramanê ku dê bikare eqrebeyên dîrokê 1400 salan paşde vegerîne û yasa û rêsayên wê demê bi ser cîhana modern a îroyîn de ferz bike. Ya ku hat hizra wî û ji dest dihat li hundur de xiste warê piratîkê. Xincî desteya derdora xwe ya xwînmij û alîgirên wan rehm bi tu kesî/ê nekir û hewla jinavbirina neraziyan û yekdest kirina civakê ji riya wehşet û dujminahiyê da û Îran kire gola xwînê. Her bi wê jî newestiya û bi eşkere dujminatiya hin welatên cîhanê kir û Îran kişande nav şerek malwêranker de ku niha jî encamên nigatîve wê mane. Şerek ku xwîna sedan hezar xortên vî welatî bûye goriyê hez û vînên pawanxwazane û nemirovane ên Xumênî. Belê piştî sê dehikan, rejîma Komara Îslamî li demekê de 34'mîn salvegra jidayîkbûna xwe pîroz dike ku Îran û xelkê wê ji ber î'nad û dujmin perweriya rejîmê gihane qonaxek hesas û karesatbar di biyavên siyasî, aborî û civakî de. Rejîma tund û tûj, terorîstperwer û lecbaz welat her roj paremayî û îzoletir û zêdetir dixe bin barê tehrîman. Hisarên ku pişta wê li bin givaşan de çemandiye.

Welatek xwedî şaristaniyet û dîrokek dirêj di bin siya rejîma totalîter de niha dîplomatên wê li her derê cîhanê bi çavê guman û terorîst ve tên nihêrîn û balyozxaneyên wê jî bi nawendên terorîstî. Di bin vê siya reş de aboriya Îranê daketiye û bi yek ji bêhitbartirîn aborî û pereyê wê jî bi bêerziştirîn pereyên cîhanê tê nasîn. Li halekê de ku li van sê dehikan de gelek welatên paremayî serbarê xwerizgar kirin ji nîrê zordarî û feqr û paremayîtiyê, niha bûne bi aboriyên herî bihêz û pêşketî li dever û cîhanê û tevlî karwanê cîhana pêşketî bûne. Lê Îrana ewqas dewlemend ji ber pawanxwazî û berzefiriyên leşkirî ên desthilatdarên wê, binêrin çi hatiye serê wê!!!? Rejîmek ku bona parastina desthilata xwe a xwînî û nîzama xwe a genî amade ye her tiştî gorî û fena bike dar li ser berê Îranê nehêle, çawa dikare dilxweş bi piştgiriya xelkî be? Dema ku hejarî, gendelî, belengazî, girtin, kuştin, îşkence, îdam, tirsandin û wehşet, giranî, mişextî, neewlehî, rondik û girî, ...hwd bûne bi par, pêxor û serhatên rojane ên welatiyan û qapûsa tehrîman her ku diçe zêdetir qirika wan digivişîne, wê çi hest û sozek xweş bi vê şoreşê û berhema wê hebin? Paşan nizanim rejîma berhemhênerê ewqas nehametî û bedbextiyan bi çi rûyekê ve dixwaze xelik tevlî festîvalên pîroz kirina salvegera şoreşê bibin? Şoreşek ku bû bela serê xelkê û gelên Îranê!

Lê renge rejîmê karîbe gelek tiştan ji xelkê bistîne û kerameta wan jî binpê bike, lê nekariye hêvî û îradeya wan dagîr bike, lewma baş dizane ku xelik mêjdem e pêhesiyane ku çi kumek çûye serê wan heya ber piyê wan û dizane ku êdî kêr gihaye ser hestiyê xelkê û beşa herî zor a wan heta ser hêstikan ji wê û rayedarên wê nerazî ne û çi dilxweşiyek jê ninin û wek borkanek temirî lê her dem îmkana teyîsîn û geşbûna wê heye. Bi taybetî li van salên dawîn de ku serhildanên xelkê li dijî dîktatoran derbasî qonaxek girîng bûye, xelkê Îranê jî li her derfetek guncaw de vê nîşan bidin ku şoreşa wan hat şelandin û armancên wê jî hatin şêlû kirin û ev felaket û bextreşiya bû ku rejîmê ji wan re berhem anî, belkî azadî û demokrasî bi wateya rastîn a xwe bû. Berhema Şoreşa gelên Îranê ne tenê bo xelkê Îranê, belkî ders û ceribînek tarî ye bo hemû xelkê cîhanê û weke berhemek şûm tê nasîn.

www.arsivakurd.org

Hejmar 199, 03'ê Şibata 2013


# Bazirganîkirina gurçikan li Îranê de germ e



Arif Vêlzî

Di dehsala duyemîn a hatineserkara Komara Îslamî a Îranê, zanista pizişkî di Îranê de gehişte astekê ku bikare peywenda gurçik ji kesek ve bo kesek din encam bide û, eva jî bû sedem ku diyardeya bexşîn û pêşkêşkirina gurçik ji aliyê malbat û kesûkar, yan jî ew kesên ku tûşî mirina mêjî bûne ber bi zêdebûnê ve here û bi vî awayî gellek nexweşên diyalîzî di Îranê de ji mirinê rizgar bûn û amara mirinê ber bi kêmbûnê ve çû.

Piştî midehekê bi sedema rewşa nebaş a civaka Îranê, diyardeya firotina endamên leşê mirov di Îranê de digel guhertinê berbirû bû û, şiklê bazirganîkirinê bi xwe ve girt. Bi awayekî ku êdî bexşîna gurçik di Îranê de ber bê kêmbûnê ve çû û di hember de jî, bazara kirîn û firotina wan germtir bû. Bi awayekî ku bona bazirganiya gurçikan di Îranê de, bi şeweyek eşkere li nava bajar û kolanan de, gengeşeya firotinê li ser dîwar û cihên giştî de berçav dikeve.




Niha di gel pêşketina teknolojiyê, bazara mafiyayî a firotina endamên leşê mirov, hem ji aliyê şikl û qewareya xwe û hem ji aliyê cura bazirganîkirinê ber bi pêşve çûye. Bo mînak niha bazara firotina gurçik û endamên din ên leşê mirov ku têne peywendkirin û herweha li şêwaza firotina wan de, guhertinên berçav pêk hatine, bi awayekî ku bazirgan û delalên zaf jêre kar dikin û herweha di dunyaya mecazî û li ser torên civakî, bi awayek eşkere reklam jê re tê kirin û heta bazara rikeberiyê jî, jêre hatiye avakirin. Lewra em dibînin ku îro rojê nirxa her gurçikek mirov di Îranê de digîje pitir ji sî milyon Tûmenî.

Eva di demekê de ye ku pisporên karûbarên civakî û tendirustî li ser vê baweriyê ne ku,di Îranê de piraniya kesên ku guçikên xwe difiroşîn, di navbera temenê 20 heya 32 saliyê de ne û, vê yekê jî weke metirsî bo pêşeroja civaka Îranê didin hesibandin.

Serbarê vê ku li gor biryarnameya cîhanî a NY, rê bi bazirganîkirina endamên leşê mirov re nehatiye dan, lê em dibînin ku di Îranê de, li gor nifûsa bajarên Îranê, bajarên Kurdakincî weke Kirmaşan û Sinê di pileya yekemîn a kirîn û firotina gurçik di Îranê de ne. bi awayekê ku li hember her kesekê ku hewceyî emeliyata pêwenda kuliyê ye, çar kes hene ku kuliyên xwe difiroşin.

Firotina endamê leşê mirov ên ku tên peywendkirin, di gellek welatên cîhana sêhem weke welatên Îran, Hnd, Çîn, Misr, Moldavî û Turkiyê de berçav e û heta gelek caran bo welatên weke Amerîka û Îsraîlê jî tên şandin.

Lêkoler û şarezayên karûbarên civakî eşkere dikin ku sedema sereke a serhildan û zêdebûna diyardeya han di civaka Îranê de, vedigere ser siyaseta abûriya şaş a Komara Îslamî ku mixabin encamên wan siyasetên şaş yên abûrî bo xelkê Îranê, hejarî, ew qasê bêkarî û tunebûna derfeta kar bo dabînkirina îmkanatên jiyana rojê û xwendin û pêkanîna jiyana hevpar û ...hwd bûye.

# Ew zarokên jêr heşt salî ku li ser şeqamên Tehranê sergerdan in



Kêmbûna temenê zarokên kar di bajarê Tehranê de û herweha mifahwergirtinên xirab ên leşî û zayendeyî ji wan, bûye sedem ku piraniya zarokên kar bi taybet zarokên ku temenê wan di bin 4-5 saliyê de ye, bo cîbicîkirina madeyên hişber bên bikaranin û bi vî awayî Jiyan û pêşeroja wan dikeve tehlûkê (metirsî) û demsalên Zivistan û Havînê, li kolanên bajaran de mijûlî kar in.

Eva tirajidiya ye, bê vê ku hemwelatiyek Tehranî bizane di berîka zarokê falfiroş de madeyên hişber hene, û piştî çend deqeyên din bêy vê ku tu kes agehdar be wê ew madeyên hişber bên tiranzîtkirin.

zarokên kar diyardeyek e ku li Tehran û bajarên din ên Îranê ber bi zêdebûnê ve diçe û, eva jî bê bernameyî ya karbidestên rejîma Îranê nişan dide.

Cêgirê Saziya "Rifah, Xedemat û Mûşarêketa Civakî" a şaredariya Tehranê serbarê arîşeyên nexweşî û tendirustî ên zarokên kar ragehand ku, hindek ji zarokên kar ku hatine komkirin, têkilî madeyê hişber bûne û dibe çareseriyek bi wan re bê kirin. Navbirî herweha eşkere kir ku 12 dezgehên hikumetî di rêxistina zarokên kar de berpirsyar in, lê piraniya wan erkê xwe birêve nabin û şaredarî jî bi tenê nikare tewaya karan birêve bibe.

Yek ji valahiyên mijara zarokên kar di Îranê de, komkirina wan zarokan e ku temenê wan di bin 8 saliyê de ye û ji aliyekê îdareya "Bêhzîstî" wan wernagire û ji aliyê din ve hebûna wan di nav bajaran de dibe sedema çêbûna arîşeyên zaf.

Jiber ku di yasaya bingehîna Komara Îslamî de zarokê kar ên ku temenê wan di bin 8 saliyê de ne nehatiye pênase kirin, lewra îdareya "Bêhzîstî" ji wergirtina wan xwe diparêze.

Riza Cagîrî di doma gotinên xwe de got ku, di salên borî de zarokên kar bi kincên curbicur derdiketin kolanan, lê niha zarok bi kincên taybet û form derdikevin kolanan û xûya ye ku ji aliyê kes yan girûpekê ve tên rexistin da ku hest û derûna xelkê di warê alîkariya bi wan zarokan birîndar bikin.

Eva di demekê de ye ku pitir ji %7o zarokê kar di gel nasaxiyên derûnî, Sêl û ...hwd ku tehlûke ye bo temenê wan, berbirû ne.

Hijmara zarokên kar ku di mehekê de li bajarê Tehranê tên komkirin digîje 1200 kesî. Bi wateyek din rojê 40 zarok ji aliyê şaredariyê di nav bajarê Tehranê tên komkirin û evên ku temenê wan di navbera 8 heya 18 saliyê de ne, radestî îdareya "Bêhzîstiyê" tên kirin, lê seba rewşa xirap a jiyana wan û herweha bona karkirin û kasibiyê, cardin derdikevin nava kolanên bajêr de ku ew yek jî tê vê wateyê ku çerxa zarokên kar wê her berdewam be.

www.arsivakurdi.org

**Mihemed Behramî:**

## Min soz û peyman daye şehîdan ku ger zindî bimînim û bi azadî vegerim Kurdistanê, serê xwe li hemberî dayîkên şehîdan bitevînim û bêjim ku min riya şehîdan berneda



Hevpeyvîn: Faxir Molûdî

Mihemed Behramî kurê se'îd, nakirî bi Girdeko di sala 1341' an a rojî di gondê Kanî Kewe ya ser bi bajarê Seqizê hat ser dinê. Di temenê 7' saliyê de çûye bo xwendingehê û heya pola 5' ê destpêkî ders xwendiye. Lê belê bi sedema vê ku mala xwe li gund bar kirine û çûne bo bajarê Seqizê, û wî pênase jî tu nebûye,dema xwe nekarîye xwendina xwe bdomîne." Mihemed Behramî midehekê li çiyayeke bajarê Seqizê bi navê çiyayê Girdeko karûbarên hizbî birêve biriye, her ji ber vê yekê li nav refên pêşmergan de bi navê Girdeko tê naskirin."

Navbirîderheq nasyariya xwe bi PDKÎ re weha ji Agirî re axivî:

"Ez û çend hevalên din, em li Tehranê di kompanyayekê de dişoxilîn û berpirsê nivîsîngeha kompanyayê jî Mame Qale Debaxî bû, navbrî her şev ji mere qise dikir hevalke din jî tevî min dişoxilî navê wî Mihemed Edhemî bû, ku em tevî hev bûne pêşmerge , lê mixabin ew hevalê min şehîd bû. Di wê demê de li bajarên Tehran û Tewrêzê meş dest pêkiribûn, her ji ber vê yekê Mame Qale Debaxî vegerya bo bajarê Seqizê û em jî piştî midehekê ku bi ser de derbaz bû vegeriyan bajarê Seqizê.

Me li wir Mame Qale dît û wî jî em naskirin û got ji bo vê ku em meşê çêbikin, dibe em hemû tevî hev heval bin.

Li bajarê Seqizê odeyek nihênî hebû ku li wir şehîd Sidîq Feroxiyan berpirs bû, û li wir karûbarên hizbî birêve dibirin. Şehîd Sidîq Feroxyan bo me qise dikir û digot dibe hevahengî di navbera me de hebe û ji bo ew dema ku meş dest pê bike, her li vêderê hin kes weke çavedêr hatin diyarîkirin

Navbirî herweha weh bas ji çûna xwe bo pêşmergatiyê kir:

"Di sala 58' ê, dema ku PDKÎ li Kurdistanê de bû, em sê kes bi hevre bûne pêşmerge. Di dema êrîşa hikûmetê bo ser Kurdistanê, şerek mezin li bajarê Seqizê çê bû, em tîmek 13' kesî bi fermandehiya şehîd Qadirxan bo midehekê li derdora bajêr me xwe veşart heya ku hêdî hêdî pêşmergên me zêde bûn. Dema ku me xwest biçine nav bajarê Seqizê de, ji bo birêvebirina emeliyatên leşkirî, mixabin hevalek me bi navê Mam Rehîm li ber Mekteba Quranê şehîd bû. Lê belê di deme veşartina termê Mam Rehîm , xelkek zaf hevkariya me kirin. Her di wê rojê de bû ku me pênc kes li caşên xofiroş bi dîl girtin û me tevî xwe birin bo derveyî bajar.

Piştî du mehan, carek din bajarê Seqizê ket destê hêzên pêşmerge de û di vê demê de Kak Faroq Keyxusrevî berpirsê komîte şaristana Seqizê bû. Piştî midehekê şehîdê nemir Dr.Qasmlo seredana bajarê Seqizê kir û li cvînek berfireh de ragehand ku netewa kurd neteweyek aştîxwaz e û şerxwaz nine û em jî weke hizba demokrat dixwazîn ku li çarçova Îranê de pirsên xwe çareser bikin, her di dema qise kirina Dr. Qasmlo de hin kesên nenas, narincekek havêtin nêzîk Dr. Qasmlo, lê bi xweşî ve narincek neteqî û çi zirarek bi dûre nebû."

Birêz Girdeko weha bas ji jiyana xw ya hevbeş kir:

"Dema ku PDKÎ hate bajarê koyê, min li vir karûbarê elektirîkê dikir û min kesek dît ku min pê xweş bû tevî wê aşna bim, her ji ber vê yekê li rêya hevaleke xwe min karî tevî wê qise bikim û ewê jî qebûl kir ku



tevî min jiyana hevpişk pêk bîne û li 26'ê Rêbendana sala 1373' an de, me daweta xwe kir û berhema jyana me jî çar zarok in ku sê keç û yek jî kur e.

Herçend ku 33 sal bi ser pêşmergetiya Girdeko re derbas dibe, lê mandîbûna di rûyê wî de nayê xuyakirin, û di vî warî de weha dibêje:

"Min soz û peyman daye şehîdan ku eger zindî bimînim û bi azadî vegeryame Kurdistanê, serê xwe bo dayikên şehîdan bitevînim û bêjim ku min rêya şehîdên we bernedaye û ez wefadarê rê û rêvîngên şehîdan bûme."

Wî nexweştirîn bîreweriya xwe roja şehîdbûna Dr. Qasmloda zanîn. Wî her weha di dawiyê de daxwaz ji PDKÎ kir ku bo pêşveçuna karûbarên hizbê zêdetir li caran hewl bidin, û daxwaz ji xelkê Kurdistanê jî kir ku bo gihiştin bi mafên xwe, her tim hevgirtî bin û zêdetir harîkariya yektir bikin.

---

**Doma gotara "Bandora hilbijartinên Îsraîlê ..." ya R:5'ê**

Netanyaho pêdagirî li ser programa etomî a Îranê kir û ragehan ku bi tu awayekê rê nade destê Îranê bi çeka etomî re bigîje. Navbirî bi awayek tund digel pirsa han berbirû dibe û herweha roja yekşemî 8'ê Rêbendanê, di civîna hikumetê de ragehand ku:

"Îran dixwaze ku Holokastek din li dijî Cihûyan bi afirîne", Netanyaho di doma gotinên xwe de ragehand ku:"Dijberiya di gel Cihû û Cihûyetê hêj di cîhanê de bi davî nehatiye", ne tenê hêviya jinavçûna Îsraîlê ji aliyê hindek kesan ve heye, belkî ji aliyê welatên serbedrayî ev hevî pir bi hêz e. Navbirî di doma gotinên xwe de îşaret bi gotinên Ehmedî Nijad serkomarê rejîma Îranê di civîna salane a NY de, hebûna Holokastê înkar kir, û her di vê peywendiyê de jî xwe bo holokastek din amade dike û dixwazin Îsraîlê li ser xerîteya cîhanê nehêle û daviyê bi hikûmeta Cihûyan bînin û Ciyûyetê nehêlin. Ew bi berdewamî hewil didin bona gehiştin bi çeka etomî, çûnkî merema wan jinavbirina Îsraîlê ye, lê em wan tehlûkeyan disekinînin, eve armanca sereke a dewleta min û netewa me ye.

Netanyaho herweha ragehand ku piştî derbazbûna çend dehikan bi ser holokastê de, hêj îrade bo pêkanîna holokastê nehatiya guhertin, lê eva ku hatiye guhertin deshelat û hêza Cihûya ne bona berevanî kirina ji xwe, çunkî hekî Cihû berevaniyê ji xwe nekin tu kes berevaniyê ji wan nake.

Di demekê de ku Nitanyahû ragehand ku Îran mijûlî avakirina Holokastek din e û bas ji metirsiya çeka etomî a Îranê kir, roja pêncşemiya derbazbûyî, sinator Can Kêrî di civîna Civata Sinaya Amerîkayê de ragehand ku Amerîka bi tenê bi kontrolkirina programa etomî a Îranê razî nabe û bi tu awayekê rê nade ku Îran bibe xwedî çeka etomî.

Uhûd Barak wezîrê berevaniya Îsraîlê, di dîmaneya xwe de digel malpera Amerîkayî "Daylî Bêst"ê de ragehand ku: Amerîka komek gelaleyên leşkirî bona êrîşa leşkirî bo ser Îranê, weke rêya herî davî û rêgirtin ji rêberên şerxwazên Îranê amade kiriye û herweha eşkere jî kir ku gelaleyên leşkirî ên Amerîkayê bi dijî Îranê, ji cureya Leyzêrî ye.

Renge Amerîka vê carê bi şêwaza Îraq û efxanistanê neke û bi taktîkên din xwa derxe holê. Navbirî di doma gotinên xwe de ragehand ku, serbarê vê yekê dibe dorpêçên abûrî li ser Îranê berdewam bin û kerta "henarde û hawirde" ya Îranê bi tewahî bê sekinandin û hevdem êrîşa leşkirî jî her hebe, çûnkî eve yasaya rejîmên dîktator e û guh nadin vê ku xelk birçî ye û ji birsan can xwe ji dest dide.

Di çend rojên derbzbûyî de serkomarê Îsraîlê û Hinrî Kisîncêr wezîrê berê ê derve ê Amerîkayê, haydarî dan Komara Îslamî ku, ne Îsraîl û ne jî Amerîka nahêlin ku Rejîma Îranê bibe xwedî çeka etomî.

Derbarê teqîna bihêz ku li binkeya etomî a "Fêrdû" li Qumê rûda, wezîrê ewlehiya Îsraîlê ragehand ku teqîna han cihê hûrbîniyê ye. Malperek Amerîkyî ji zarê Hemîd Riza Zakirî ve ragehand ku, teqîna han di roja çarşemiyê rû da û derbek mezin ji binkeya etomiya Îranê xist û niha pitir ji 280 kes ji pspor û kedkerên vê binkeyê, di nav cihên herifî de asê mane û rêya wan hatiye girtin, herçend karbidestên Komara Îslamî evê bûyerê înkar dikin, lê tu giringiya vê înkarkirinê nine.

www.arsivakurdi.org

# Bajarê Sine



Mecîd Cinîkanlû



Sine yek ji bajarên Kurdistana Îranê ye û bi nawenda parêzgeha Kurdistana Îranê tê naskirin. Peyva Sine di zaraveya Soranî a Erdelanî de bi wateya "Kelh" tê. Bajarê Sinê li dirêjiya zincîre çiyayên dîrokî ên Zagrosê de cih digire û li hembêza wan çiyayan de bejna xwe bilind kiriye. Helkevta cuxrafî a bajarê Sinê bi awayekî ye ku ji aliyê rojava, Bakûr û Başûr ve dikeve navbera çiyayên Awyer, Şêx Merûf û Serajeddîn ve. Nifûsa w li gor serjimêriya sala 1385'an a Rojî 311,446 hezar kes bû.

Bajarê Sinê bi sedema vê ku li biniya çiyayê Awiyerê cih digire, weke kelekê tê xûyakirin, lewma bi "Sine Dij" hatiye binavkirin. Dij li zaraveya Soranî a Erdelanî de bi, wateya Kelhê tê. Jak (cek) Domorgan ku li dawiya deshilatdariya Nasiridîn Şahê Qacar de serdana Îranê kiriye dibêje; di tewahiya cîhanê de ew bajar bi Sine hatiye naskirin.

Sine li serdemê kevnar de wek nawenda olê zerdeşt hatiye naskirin. Di dîroka Îranê de gellek ji istoreyên efsaneyî bi xelkê vê herêmê hatine naskirin. Bajarê Sinê di serdemê Sefewiyan de û di sala 1046'an a mangî de, ji aliyê kesekê bi navê Sulêman Xanê Erdelan ve hatiye avakirin û ber bi bajar bûnê ve çûye. Xwezaya bajarê Sinê gelek xweş û bedev e. Lê di çend salên bihûrî de bona siyaseta şaş a Rêjîma Îranê û herweha dijayetî û jinavbirina Kurdan, parek ji daristanên vê ji aliyê hêzên Mokara Îslamî ve hatin şewtandin.

Herêma Sine pitir ji 400 salan cih û warê mlabta Erdelaniyan bûye ku, yek ji malbatên xwedî hêz û bi navûdeng ê Kurdistana Îranê bûye. Malbata Erdalan ji bilî midehek kêm, bi dirêjiya deshilatdariya Sefeviyan, xwediyê bajarê Sinê û derdora vê bûne.

Li serdemê hikûmeta Zendiyan de bo heyameke kêm bajarê Sine ket destê Zendiyan de û bajêr hat kawil kirin, lê piştre bi hewlên Xosro Xanê Erdelan cardin deshilta malbata Erdelan li herêmê de hakim bû. Erdelanî di dîroka Kurdan de wek malbatek xwedî qedir û qîmet hatine naskirin û di nav wan de gelek kesên welat parêz, helbestvan û nivîskarên wek Şehîd Homayûn Erdelan endamê Komiteya Nawendî a PDK Îranê, Mestûre Erdelan jina helbestvan û gellek kesên din perwerde kirine.

Bajarê Sinê wek bajar heyamke gellek kevin niye ku hatiye avakirin. Di sala 1046'an a Heyvî, Silêman Xanê Erdelan bi merama leşkirî û çêkirina bingehek siyasî li ser kopikekê û li tenişt gundê Sine xîmê bajarê Sinê dana. Sine haya sala 1340'an a Rojî, wek bajarek biçûk dihat hesibandin, lê paşan bi sedemên cûr bi cûr mezin bû. Li sala 1357'an a Rojî de, bajar bi awayek berçav dest bi mezinbûnê kir û xelkek zaf hatin û di nav bajar de akincî bûn. EV mezinbûna han hemberî 350 sal temenê avabûna bajêrê Sinê bû û nifûnsa bajar jî du qas zêde kir.

Bi sedema hatina xelkek zaf ji gund û herêmên derdûra bajarê Sinê û nasandina Sine wek nawenda herêmê, roj bi roj hejimara nifûsa wê zêdetir kir. Bjarê Sinê serbarê vê nawenda parêzgeha Kurdistan a Îranê hatiye naskirin lê her wek xûya ye rejîmên zal bi ser Îranê de, bi armancên siyasî û ji bo meramên xwe yên gemar, ev nav bi ser parêzgehê de danine. Deshiladarên Îranê bi danîna navê Kurdistanê li ser vê parêzghê wiha diden xûyandin ku li Îranê de tenê yek parêzgeha Kurd akincî heye, lê di rastî de hemû herêma rojavayê Îranê ji bilî herêma Xûzistanê, hemû Kurd in û Kurdistan e.

Ew yek jî bi dirêjiya dîroka Kurdan di Îranê de hatiye îsbat kirin û em dibinin ku Kurdên wan deweran ji her derfetekê bona bidestanina mafên xwe yên netewî mifah sitandine. Her wekû di destpêka serhildana gelên Îranê, Kurdan bi awayek baş û bi rêberiya PDK Îranê dest bi berxwedan li hember rejîma Îranê kirin û di vê pêvajoya dîrokî de karîn bo heyamekê bajarê Sinê bixin bin deshilatdariya xwe.

Lê mixabin Xûmêynî rêberê Komara Îslamî bi dana fermana cîhadê li dijî Kurdan, şereke malwêranker xiste nava Kurdistanê de û di encam de bi sedan kes ji xelkê herêmê, bûne goriyê siyasetên şerxwazane a deshelatdarên Komara Îslamî û şehîd ketin.

Sine serbarê wan hemû buha û nirxên giran ku di pêxema azadî û serbestiya Kurdistanê de dayê, hêj jî xebat û berxwedanê nevestiya ye, û niha jî bi Kela Kurdayetiyê tê naskirin.

Doma Gotara "Dersa Komara Kurdistanê..." a R: 5

derbasbûna ji eşîregerî û tayifegerî ber bi Kurdbaweriya neteweyî, derbazbûna ji kêşe û nakokiyên olî ber bi wergirtina çend olî û curbicurxwaziyê, yekîtiya sitratejîk bi Azeriyan re, û pesendkirina lihevhatinên piştevaniya ji kêmaniyan li hewzeya deshilatdariyê, cihgirkirina nîzama ewlehiya modern, çapemeniyên tewaw azad, û hewildana bo çap û weşandinê, perwerdeya bi zimanê Kurdî wek zimanê fermî û zimanên din li Kurdistanê de, avakirina radyoya Kurdistan û propagendeya hemû alî bo dabînkirina hewcehiyên çandî, perwerdehî û siyasî li tewaya waran de, li rez hewildana ji bo piraktîzekirina armancên demokratîk li hewzeya hikumetî a Kurdistanê ji taybetmendiyên berçav ên wê dewranê tên hesibandin.

Li warê çapemeniyan de, û ya ku wek gewahyarî ji çapemeniyên wek Nîştiman, Hawara Kurd, Hawara Nîştiman, Kurdistan, Helale, û ...hwd mirov dikare jê fam bike, mirov dikare biselimîne ku pêdegirî li ser mafê dîyarîkirina qederê ya neteweyan û mafê serbixweyiya neteweyan, hewildana bo pêkanîna şoreşa rohnkirinê bo neteweya Kurd, rabûna ferhengî ya neteweya Kurd, aştî û demokrasî bo cîhanê, çûna bo nav hewzeyên çandî û civakî û kêmkirina dîtingehên eşîrî û qewmî û mesebî ye ku bi





rehetî mirov dikare li gorî belgeyan basê bike.

Giringîdana Komara Kurdistanê bi pirsên jinan û danîna komîteyek taybet bo jinan bi çavdêriya Qazîmihemed bixwe, ew jî li vê demê de, ji Qazî Mihemed mînakekê bo rêberiyê dixwaze, ku mirov dikare li gorî wê, li ser bingeha wan, bigîje gellek ji wan usulên ku li astê navneteweyî de li ser disekinin.

Komara Kurdistanê xala destpêkirina hilbijartinek siyasî bo demokrasî, li serdemê deshilatdariya otorîteyan li ser Rojhilata Navîn bû.

www.arsivakurdi.org

# xwendegeha demokrat a kurdistana Îranê!





Kavûs Ezîzî

Xwendegeha demokrat ku di sala 1945'an de li bajarê Mehabdê hatiye avakirin, heya niha jî kar û xebata xwe didomîne. Vê xwendegehê pir ked daye neteweya kurd ku bi awayê jêrîn e:

Destpêka xebatek modêrn di çarçoveya partek siyasî de. Cihgîrkirina hinek peyvan ku heta vî çaxî di nava bizava kurdî de pir xerîb bûn, bo mînak peyva demokrat, partî wate Hizib, komar, sirûda netewayetî ya Ey Reqîb, ala kurdistanê, dîplomasî, xwendin bi zimanê kurdî, rojnamegerî ya rojaneya azad û hizbî, radyoya azad, ragehandina komarek kurdî ku seha bawerî bixwehebûnê di nav kurdan de sax kirin, sipaha millî ya kurd wate pêşmerge, serînetevandina bo dagîrkeran, berxwedan, rêveberiya bi kom, lihevnêzîkkirina kurdên hemî parçên kurdistanê li komarekê da, kovara zarokan, jinan, lawan, xwendekaran, pêşmergeyan, ronakbîran, xebata û berxwedana çekdarî, beşdarî kirina jinan li xebata siyasî, dîplomasî, çekdarî, kultûrî, rojnamegerî û ...hwd de, serxwebûna siyasî û dîplomasî, pêkanîna yekîtiyên lawan, jinan, xwendekaran, mamostayan û ...hwd, hinartina xwendekaran bo xwendina bilind li welatên Ewropayî, anîna pizîşkên biyanî bo kurdistanê, danîna yekemîn mekteba nûneratiyê li welatek wek Feransaye, harîkarî bo damezrandina enstîtûyek kurd li Parîsê. Vê xwendegeha han, mamostayên herî başe xwe kirine goriyê gel û welat. Ew xwendegeha ku berxwedan hînî me kir, û em jî xwegorîkirinê ji mamostayê xwe yê yekemîn hîn bûn, Pêşewa Qazî mamostayê yekemîn, û Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkednî jî mamostayên din.

Evne û bi hizaran kedên din li vê xwendegehê de bo gelê kurd bûne bingeha netewebûnê û rûpelên dîroka neteweya kurd xemilandine.

Belê ew xwendegeh "Partiya demokrat a kurdistana Îranê" ye ku partiya şikandina sînoran bûye. partiya qorbaniyên mezin, partiya ku berdewam ketiye ber qehra terorê.

Werin da ku em hemû bi hevre vê xwendegeha birûmet mezintir, xwedî bandortir û berfirehtir bikin. Ew partiya ku hêla jî ciwan e û pîr nabe, roj bo rojê jî xwe di gel serdem diguhere û xwe nû dike. Bila em li vê xwendegeha herî bi rûmet xwedî derkevin.

# Sê Gul



Ehmed Huseynî

Gulekê rojçêbûna xwe ji xwînê re digot..
Gulekê ji bîna axê re behsa baranê dikir..
Gulekê jî di guhê azadiyê de kurtepist dikir..
Sê gul di ronahiyê de dilerizin.
Sê gul ber bi dilê welatê min ve dibezin.

Ma tu nema dest ji pêşwaziya darbestan berdidî Amedê!?
Ma tu nema birînên keleha xwe,
Xewnên hespên xwe
Û pencereyên dilê xwe derman dikî Amedê!?
Ma tu nema berbanga azadiyê
di şeneyên me de bêşik û bêguman dikî Amedê!?

Sakîne Cansiz
Rûpela spî ya jiyanê ya ku bi agirê rondikan dişewite..
Bîna rastiya ronak a ku ji gulên evînê difûre û jê bêpar dimîne..
Nameyên bêzar ên şevê yên ku tenhatiyê dikujin..
Zeviyên tênahiyê yên ku çavên xwe li ewran digerînin..
Peravên xewnan ên ku di pêlên hêviyan de dixeniqin..
Birînên min ên ku ferhengên êşê bi êşê diafirînin..
keskesora bêrîkirina min a ku di asoya mirina min de dilerize..
li ber pencereyên xatirxwestinê rawestana sirûdan..
çavên girtî yên heyva çardeşevî ku nema stêrkên hevdîtinê dibînin..
Guldanka dilê şoreşan a ku bi gulên oxirê di ser dev re diçe
deryaçeyên bîranînan ên ku bi pêlan re dipeyivin..
Sînga sibehê ya tijî raz û tijî balinde û tijî rojçêbûn..
Çavên Parîsê yên ku li mirinê dinêrin..
Çavên Amedê yên ku di mirinê de diçurisin..

Fîdan Dogan
Ewrê Parîsê pemboyê birînê amade dike,
Pêlên deryayê peravan bi girî vedikin,
Şînê şîniyan bi destmala destê êvarê radipêçin,
Şengebî digirî..
Tu dilop î, tu çavên çiyê
Bi reşeewran girêdidî..
Tu kilîta azadiyê bi xwe re
Ber bi Deriyê Ruhatê ve dibî..

Leyla Soylemez
Ji mirinê bi dûr nekeve,
Di çavên te de mêkewan dibînim..
Di nermika destê te de tembînameya begerê,
Li ser lêvên te sirûda hespên şevê,
Li ser serê te tacegula baranê..
Di sînga te de keservedanên rojê,
Di sîbera te de refên qulingan..
Û
Û
Di hawara te de dilbijîna Behra Wanê dibînim..

ehmedehuseyni@live.co.uk
London 15. 01. 2013

www.arsivakurdi.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com

Mihemed Agca:

## Min li Xomênî ferman wergirtibû



**Mihemed Agca ku di sala 1981'an Pap Jan Polê duyem di qada Sint Pitirzborgê de kire armanca gulleyan, di pirtûka xwe de nivîsiye ku fermana terora rêberê Katolîkên cîhanê ji Xomeynî wergirtbû.**

Ew Turkekî Îslamêst ê tund e, û navê wî Mihemed Elî Agca ye, Ku di salên borî de ku bi sedema kuştina rojnamevanekî di Turkiyê de hatibû zindanîkirin, îdia kir ku piştî helatin di zîndana Turkiyê de çûye Îranê û meimuriyeta terora Pap Jan Polê duhem rêberê katolîkên cîhanê di Tehranê de dabûne wî.

Pirtûka navbirî di roja Înê li Îtalyayê li jêr navê "soza biheştê bi min hatiye dan, jiyana min û rastiyên pişt perde ya terora Pap" de çap bû.

Pap Jan Polê duhem di êrîşa bi armanca kuştinê ya di sala 1981'an de, bi tundî birîndar bû, lê ji mirinê rizgar bû.

### Soza biheştê

Mihemed Alî Axca piştî girtina xwe gotibû ku terhê terora Pap ji aliyê Saziya sîxorî a şorewî "K. G. B"û girûpek ji dîplomatên Bolxaristanî ve hatiye darêtin.

Axca hevdîtiba Pap ya di gel xwe, di zîndanê de jî bi hûrî aniye ser kaxezê. Pap Jan Polê duyemîn di sala 1983'an çû benda wî di zindanekê di Romayê de, û ew efû kiribû.

Aqca di pirtûka xwe de nivîsandiye ku Pap jê pirs kiriye ku fermana kuştina wî çi kesekî daye û soz daye ku rastiya wê terorê eşkere neke, piştî wê ku Mihemed Alî Aqca rastî jêre anî zimên, Pap dibêjê: "Her wek ku ez li te borîm, ez li wan jî diborim".

Nivîskarê pirtûka "jiyana min û rastiyên pişt perde ên terora Pap dinivîse ku min di salên derbasbûyî de riyek şaş dabû pêşiya xwe û bi salan di xizmeta faşîzma îslamî de bûm, lê niha derketiye ku Îsa Mesîh baştirîn mirov e ku hatiye ser rûyê erdê. Ew mirovê 55 salî, 19 salan di zîndana Îtalyayê de derbaz kir û piştre şandin Turkiyê.

Di vî welatê de jî deh sal zîndanî kêşa. Ew di sala 2010'an de azad bû. Karbidestên dadwerî yên Turkiyê derheq silametiya derûnî ya wî bi şik û guman in.

## Dîmenên rêûresma 2'ê Rêbendanê li herêma Kurdistan, rêbendana 2013'an











www.arsivakurdi.org